# Sîyaseta terorkirina serkirdên Kurd li Îranê bi dirêjîya çerxan

**Nivîs**: Dr. Firset Mer¨î
**Werger** bo tîpên Erebî: Seid Ebdulrehman Doskî
**Werger** ji tîpên Erebî bo tîpên Latînî: Veysi Aydin

Ew devera Kurdî li Îranê, Kurd bi "Kurdistana Îranê" bi navdikin. Ev devera, anko Kurdistana Îranê dikeve rojavayê Îranê û ji çar parêzgehan pêk tê. Ew parêzgeh jî evin: Azerbeycan, kî melbendê wê bajarê Urmî ye,  Kurdistan, kî melbendê wê bajarê Sine (Senendac) e, Îlam, kî melbendê wê Îlam e, Kermanşah, kî melbendê wê Kermanşah (Baxtiran) e. Di heman demda hikumeta Îranê parêzgeha Sine (Senendec) bi şêwekî fermî bi Kudristan bi navkirîye.

Li Îranê piştî Faris û Azerîyan (Azerbeycanîyan) Kurd bi sêyem netewe dihêne hijmartin ji layê jimara kesanve. Hejmara Kurdan digihêje 10 mîlyon kesan, anko %18 ji sercem xelkê Îranê. Lê Îran hewl dide, Kurdên şîe ji Lor û Kurdên din yên sune (sunnî) ji hev cuda bike. Hejaya gotinê ye, kû ruberê Kurdistana Îranê 125.000 qm ye, anko %8ê ruberê Îranê tê texmînkirin.

Li Îranê milletê Kurd dabeşî 30 hozan dibe... Giringtirîn hozên Kurdan evin: Şiqaq, Mukrî, Dîbokrî, Bilbas, Celalî, Ciwanro, Sincarî, Goran. Kurdên Îranê ji bilî melbendên parêzgehan hindek melbendên bajêrî jî hene. Ewan ji evin: Mehabad, Mako, Selmas, Seqez, Bane, Serdeşt, Lahîcan.

Gelê Kurd zimanê xwe yê taybetî heye. Ew jî zimanê Kurdî ye, kû ji çendîn dîyalektan pêk tê. Zimanê Kurdî zimanê serbixwe ye. Yasa û desturên xwe yên rêzmanî û yên zimanewanî hene. Zimaê ne dîyalekteka Farisîya biçuke, wekî hinek zimannas û nivîskarên Faris li pê diçin. Her çende zimanê Kurdî û Farisi ji yek xêzana (aîla) zimanîne, kû ew jî Hînd-Îranî ye. Lê zimanê Kurdî ji pişka bakurî-rojavahî ye û Farisî ji pişka başurî ye.

Ji ber, kû her du zimanên Kurdî û Farisî ji yek xêzanên zimanî ne, gelek serkirdên Îranî li pê vê yeke diçin, ko Kurd pişkekin ji Farisan. Eve buye egerê hindê, kû biryarçêkerên Farisî hewl bidin, rewşenbîrîya Kurdi di nav rewşenbîrîya Farisîda bihellînin. Bo vê proseyê jimareka zanayên mêjuyî (dîrokî) û edebî yên destnîşankirîn, bo nimune Reşîd Yasmî bi fermana wezareta zanîyanê Îranî pertukek li jêr nav û nîşanê "Kurd û peywendîyên wan yên nîjadî û mêjuyî" nivîsî. Merem  ji nivîsandina vê pertukê ew bu, dîyar bike, kû Kurd ji Farisane û ne neteweka cudane. Li ser hemu dam û dezgehên û polên qutabxanan (dibistanan) nivîsandin: "Farisî biaxivin!".

Bi heman şêweyê hinek nivîserên din yên Îranî hewldane, Kurdan bi Farisanve girêdin... Ji wan nivîseran hinek evin: Dr. Sincabî û Dr. Nadirî babetek li jêr nav "Kurd û Kurdistan" di rojnama Bastan (kevn) da nivîsî û Dr. Afşar di Ayinde nivîsî, Nahîd yê di rojnama Nahîd nivîsî û gellekên din.

## Ayinê Kurdan

Bara pitira Kurdan ji misilmanên sune ne û li pê rêbaza şafiî diçin. %80 yî Kudan sune ne. Lê hindek komelên dî ji Kurdan hene, li gorî bîr û bawerîya duwazdeyî yên bune şîe. Ev Kurdan li deverên başûrê Kurdistan Îranê, li parêzgehên Kermanşah û Îlam akincîne. Sererayî vê çendê hindek olên (tayfe) yên din yên Kurdan yên Kurdistana Îranê heyin û dibêjinê "Xudayên Rastinê" (Ehli Heq) û dikevine jêr navê ola "El Alî El Alahî" û bîr û bawerîyên wan ji şîekirinê El Îsmaîl El Batinî di gel hindek bîr û bawerên kevn yên Îranî wek Zerdeştî û Manewî û Mazdekî û Marenî hatine têkelkirin.

Vekoler bo hindê diçin, kû ev rêka ne dîyar û batinî bi karîgerîya bîrûbawerîyên babaî û hirufî û Bektaşî û Sefewî bo deverên Kurdî yên her du kertên Luristan û Zehab (ewa nêzîkî sinurê Îraqê) hatine veguhestin (şandin). Yek ji vekolerên şîe dupat dike, kû ev Kurdên batinî ji bermayên verêja rêça Sefewîya ne.

Di mawê salên 1502 – 1992da jimareka binemalan desthilatdarî li Îranê wergirtine. Ev binemalan ji regezên cuda cudane wek Faris, Tirk, Efxan û Kurd.

## Toximê dewleta Sefewî û destpêka şîekirina Îranê

Toximê Sefewî vedigerre Şêx Sefer El Dîn El Erdebîlî 1252 – 1343 zayinî. Hinek bo wê çendê diçin, kû toximê şêxî digehête Husên kurrê elî kurê babê Telîb. Her çende gellek ji mêjunivîsên Faris û Tirk vê gotgotkê bi newyî derdixin û wê bi boçuneka nerast dijmêrin. Nexasma ew gotgotka sef-eldînî digot, kû ew ji toximê elewîne. Her wiha hatîye gotin, kû Sedr Eldîn, nevîyê Sef-eldînî nedizanî, ka ew Hisênî na yan Hesenî ne. Mêjunivîsê Îranî Ehmed Kesrewî dîyar dike, kû Îsmaîl Sefewî ne, digot "Em Elewîne".

Bi vî şêweyî bi girupkêş li dor şîekirina Şêx Seyf el dînî peyda bu. Her çende axaftina dirust dupatîyê li hendê dike, kû Şêx Seyf el dîn ser bi meshebê şafiî bu, lê Hemdullah El Mistefa El Kezwînî li pêşekîya axaftina xwe da wisa li ser xelkê Erdebîl dibêje: "Pirranîya xelkê Erdebîlê yên li ser mezheba îmam şafiî û ew jî mûrîdên Şêx Seyf el dîn Erdebîlî ne. Her wisa serkirdê Uzbekî Ubêdullah Xan li sala 1530 nameyek bo Tahmasb nivîsî û têda amaje bi hindê kir kû Seyf el dîn sunnî ye. Di heman demda derbarey vê çendê xuyakir, kû Seyf el dîn kesekî bi qdrûqîmet û rêylêgirtî bu û ji ehlê sunnet û cemaetê bu.

Lewra pirranîya dîroknivîsan dupat dikin, kû çuna mala Sefewî berew şîekirinêve piştî mirina Şêx Seyf eldîn li serdemê kurr û nevîyên wî bi dumahî hat. Renge wan bi terwîckirina hindê, kû ew ji regezê elewîne divîya jimareka mezintir harîkar û dûkeftîyan li xwe kom bike...........

Serdema Sefewî (1502-1736) destpêkeka nuh bo mêjuya Kurdî li Îranê dana. Pirranîya berperrên wê mêjuyê mergesat, kûştin, hejarîyê.Di bêjîn hindek pêşewayên Kurd ji bajarên xwe hatibun da kû dilsozîua xwe bo Îsmaîlê Sefewî bikin. Lê ew nikanîbu tehammula wan jî bike, belku (bil ekîs) fermana girtina wan da û li şuna wan pêşewayan hinek dûkeftîyên xwe yên qizilbaş kirine mîr. Sebaret vê yekê mêjunivîsê Kurd Mihemed Emîn Zekî Beg dibêje: Serdema Şah Îsmaîlê Sefewî û mêjuya wî di nav Kurdan da serdema sîtemkar û dijminayîyeka gellek dijwar bu. Çunkî Kurd sunnî bun û Şah Îsmaîl Kurd ne dida gel xwe û bawerî pê nedihat. Ji ber vê çendê her derfeteka bi dest wî keftiba, jê ne diborî û azareka mezin têda digîhand Kurdan. Pîlana Îsmaîl Sefewî berambar Kurdan ew bû, kû mîrgehên Kurdî nehêle û şûna wan desthilat û sultanîya qizilbaşîya şîe dayne.Ev pîlana Sefewî beruvajî pîlana Osmanî bu. Pîlana Osmanîyan ew bu, kû mîrgehên Kurdan bimînin, da kû ew bi xwe bi xwe desthilatdarîyê li xwe bikin û di gel vê çendê ferbu mîrgehên Kurdî sozdarîya xwe pêşkêşî sultanê Osmanî kiriba.

Ji egerê cîyawazîya dijwara olî û regezî di navbera Kurd û Sefewîyan da, Kurd dijî desthilatdarîya Sefeyîyan rawestan. Kudan dest dan ser wan desthilatdarên di gel Sefewîyan ewên di wê serdemê de desthilatdarî li hindek perçên Kurdistanê li her du layên Osmanî û Îranî dikir.

Dema Şah Îsmaîl hewl daye, desthilata di nav Kurdistanî da ji destdayî bivegerîteve, nikanî bu vê meremê bi cih bîne. Îunkî Kurdî bi nîyetên wî yên pîs û zordar û kêmbihakirina wî bi gîyanî morovî hesyan. Lewra her cihê Îsmaîlê Sefewî û leşkerên wî çunê, tûşî bergirîyeka tund dibun. Û Kurdan ew îenda li bajarê Tebrîzê bi serê birayên wan yên Turkmen hatî, ji bîr nekiribun. Dema Îsmaîl Sefewî çuye nav Tebrîzê, pirsa ola (mezheba) wan kirîye. Jê re hat dçyarkirin, kû sê pişkên xelkê Tebrîzê sunnî ne. Îsamîl Sefewî gote wan, “ew kesê pîtekê bitnê bêje, ewê şûrê xwe bikşîne der û nahêle yek bijît”. Bi vî awayî bîst hezar kes ji xelkê Tebrîyê hatin kûştin. Ji ber vê çendê dema hêzên Sefewî dora bajarê Dîyarbekir dorpêç kir, xelkê vî bajarî bo mawê salekê bergîrî ji xwe kir û dijî leşkerên Sefewî rawestîyan. Her çende, kû ev xelke ji encamê vê durpêça sitemkar tûşç tundtirîn corên tengavî û birsê bun. 15 hezar kes ji xelkê Dîyarbekir hatin kuştin. Eger Sefewî bi serkeftibana û Dîyarbekir dagîrkiribana, dê karesat gellek mezintir ba.

## Reh û rîşalên mejuyî yên tîrorkirinê li Îranê

Sererayî wan şikestin û kuştarên bi komên Kurd û komên din yên sunnî ji Turkmen û Beluşan li Îranê tûş buyine. Lê Sefewîyan (1502 – 1736) her hewl dane, serkirdên Kurdan ji zanayên ayînî û serokhoz û desthilatdarên deveran û -di çerxa nuh da serokên partên sîyasî- ji nav bibin. Sefewî ta radekê di pîlana xwe da serkeftin. Dema hinek babikên din yên Îranî wekî Qaçaran (1796-1925) û Pehlewîyan (1925-1979) û serkirdên şoreşa Îranî (1979 - ?) desthilatdarî li banîya Îranê wergirt.

Her ew jî li ser rêbaza Sefewîyan çun û pîlanên wan bi cih anîn lêî bi hindek şêwazên din. Lê naveroka wan her yekin. Yek şêwazên wan di gel Kurdan bi kar anîn, nedana derfetê bu bo gelê Kurd, da kû yek bigrin û dubar gîyanê bergirîkirinê di navde bihête rêkxistin. Desthilatdarên Îranî bi dirêjîya îerxan hewl

dane, gîyanê berxwedan û bergirîyê li cem Kurdan bimrînin û eve wê çendê nagihînit, ku serkirdên Kurd yên li parçeyên dî yên Kurdistanê tuşî hewên ji navbirin û terorkirinê nebuyine. Lê li Îranê ta radeka mezin ev dîyardeya ber çav bu û hêşta jî berdewame. Her kesê duvçuna vê dîyardê bike, dê bi şêqekî dîyar bo wî aşkira be, kû ev dîyarde di mêjuya Îranê de bo serdema dewleta Îsmaîlî yê batinî vedigerre. Hêjaye bêjin, kû dewleta Îsmaîlî ya batinî li kelha mirinê ewa dikevîte binarê çîyayên berz ewê li hindav derya qezwîn li ser destê Hesen kurrê Sebehhatîye damezirandin û ev dewleta her ji sala 483 – 653 koçî û ta Hulaguyî destê xwe danabu ser ya berdewam bu.

Hesen kurrê Sebahrêkxiraweka fîdakar, xwekujî bi têgehê serdema nu, damezirand. Mêjunivîsan ev rêkxirawa bi navê “El-Heşşaşîn” bi nav kirîye. Merema vê rêkxirawê terorkirina wan kesên dijî dewlet û ola Îsmaîl bu. Endamên wê her ji biçukatî dihatin jêgirtin, da kû fêrî hunera kuştin û terorkiriê bibin. Endamên vê rêkxirawê her ji terorkirina wezîrê Selçuqî Nîzam El-Melîk li sala 485î koçî nav û dengeke berfireh wergirt. Wan tirs û lerz dixistin dilê wan kesên dijî wan bun. Eve gîhaşt ta wê radeyê, kû sultan û mîr nikanî bun, xwe ji fîdakarîyê biparêzin.

Damezirênerên vê rêkxirawa terorê gencan rêkdixistin û bi gîhayê heşşîş bêhuş dikirin. Eve bu egerê hindê, kû mêjunivîs wan gencan bi “Heşşîşîyan” bi nav kirin. Ji ber zêdebuna wan kiryarên terorkirinê –ewên heşşîşîyan bi dijî wan kesên dijatîya wan dikir, ji misilman û mesîhîyên latînî encamdayin- ev peyva bi şêweyê “Assassins” çun nav ferhengên Ewrupî yên nuhda û ramana wê jî terorkirine.

## Sefewî û rola wan di navbirina Kurdan da

.

Sefewî di maweya desthilatdarîya xwe da li ser Îranê bi jimareka kiryarên ji navbirina serkirdên Kurdan rabun. Yên ji hemîyan dîyartir evên xwarê ne:

1- Mîrê Kurd Cîhangir kûrrê Şah Rustem e. Eve yeke ji binela Hesenewî ye. Ev binemala desthilatdarîya kertê Luristan – ewe dikevin başurê devera Kermanşah -, dikir. Ji layê Ûah Tahmasb – 1587-1629- hate kuştin.

2- Şah Werdî kurrê Mihemedê Mîrê Luristan li sala 1596an ji layê Şah Abbas ê mezin hat kuştin.

3- Mîrê Kurd Xanê Lepzêrîn yê Biradostî , xudanê destê zêrîn, û leşkerê wî, ew leşkerên li dijî hêrişa Sefewîyan bo ser kela Dimdim bergirî dikirin, ji layê Şah Abas ê mezin û leşkerê wî ve hatin kuştin. Hêjaye bêjin, kû kela Dimdim bi 10 KM durî bajarê Urmî ye û ev kela tuşî hêrişeka dijwar a Sefewîyan buye. Beramber wê jî bergîrîya urdan gellek tund buye. Wî radeyî mêjunivîsê Sefewî, Îskender Beg Turkmen Menşeî, bi vî şêweyî barudoxan pesnd dike, û dibêje: “Ecemen, anko Sefewîyan, xwe yek ji şerrkeran (Kurdan) û ji neşerrkeran sax nehêlan û hemî bi şêweyeka kirrêt kuştin. Ev hemî nexoşî û derdeserî bune destanek bi navê “Kela Dimdim” û rojhilatnasan amaje pê kirîye. Stranbêjan jî stran pê gotine.

4- Sala 1690ê zayinî Şah Abas ê mezin kanî bu, Mîr Qubad Xan ê serokê hoza Mukrî ya Kurdî û di gel 150 kesan ji hevalbendên wî ji navbibe. Her wisa Abas ê mezin fermana ji navbirina hemî Mukrîyan derxist. Di heman demê de bi hezaran kurrên hoza Mukrî hatin kuştin û bi hezaran jin û zarokên Mukrî hatin êsîrgirtin. Her wisa Abas bi hezaran xêzanên (aîleyên) Kurd berev devera Xorasan, dikeve rojhilata Îranê, koçberkir.Ev xêzanan koçberdikirin, da kû wê xûngermîya wan bo wê axa ew li ser dijîn nehêlin. Dîsa da kû agirê şoreşa wan bivemirînin û di rezîlîya xerîbîyê de bijîn. Her wisa bo vê yekê bu, kû ev xêzane bibin navberka mirovayetî di navbera Sefewî û wan Ozbekan da ewên li pişt ruberî dijîyan. Lêkolîner vê yekê jî dîyar dikin, kû merema Şûah Abas ê mezin bi van pêrabunan ew bu, da kû Kurdên sunnî bibin yekemîn kes kû bi derbên Ozbekên sunnîî bikevin, kû bi vê çendê dê bi carekê ji herdukan qurtal be.

## Nadîr Şah û peywendîya wî di gel Kurdan

Piştî wê têkdana egera zalbuna Nadir Şah bi ser deshelatêda (1736-1746) li gorrepana Îarnê peyda buyî û binemala Sefewî nemaye. Milmilaneka tund li ser deselatêda peyda bu. Dewletên dewruberên Îranê dest bi maytêkirina karubarên wê yên navxweyî kir. Lê sererayî vê çendê Nadir Şah wekî yên berî xwe dilreqî dijî Kurdan û bi taybetî ewên li deverên Mukrîyan û Botan û Hewlêr dijîyan bikar anî. Herwisa ew serhildana hoza Dunbilîyan pê rabu. Çirûskên wê gîhaştin deverên Xoy û Selmas li dumahîya bakurê Îranê, wer li Nadir Şah kir, kû bi hinek kuştarên bi kom rabibe, ta wî radeyî jin û zarok jî jê qurtal nebûn. Derberayî wê çendê mêjunivîsê Kurd Mihemed Emîn Zekî dîyar dike, kî reftara Nadir Şah bi hîç rengekî baş nebuye. Ji ber vê yekê gellek herbên Kurdan jê vedibun. Ta wî radeyî Kurdan hozan bi diyalekta Goranî vehandîne û têda hevêtîye Nadir Şah û ew bi mirovekî dilreq û xedar besindkirîye. Hêjaye bêjin, kû şah Nadir Şah li 20ê temmuza 1747ê zayinê di hewên xwe da li dijî Kurdên Xorasan, ew Kurdên Şah Abbasê Mezin di sedê 17an da nefîkiribu (sirgun kiribu), hatine tîrorkirin.

## Qaçarî û peywendîyên wan di gel Kurdan

Qaçarî di regezda hozeka Tirkî ye. Bi ser ola Şîîve ye. Li bakurê Azerbeyca û Mazandan akincîne. Dema Sefewîyan hewildane, kontrolê li ser banîya Îranê bikin. Qaçarîyan harîkarîyên mezin pêşkêşî wan kirin. Piştî kujtina Nadir Şah li sla 1747an Axa Mihemed Xanê Qaçarî (1742-1797) ew lawazîya desthilatdarîya Zindî (Kurd) ya bi xweve dîtî (îstîxlal) kir. Di heman demda li sala 1794an kanîbu, bi ser dumahîyek desthilatdarê Zindîyan Letîf Elî Xan bikeve, da kû serdemeka nu ji desthilatdarîya Îranê li jêr kontrola binemala qaçarîyan li sala 1925 dest pê bike. Hêjayî bêjin, ku gorî salixdana mêjunivîsê Îranî Se¨îd Nevîsî, Axa Mihemed Xan mirovekî dilreq û navçavgirê bu. Yekî zikreş bu. Mirovekî lêborîn nedizanî beramber kesên kerba wî jê dihat. Ji ber vê yekê jî wî di dilreqîya xwe da beramber Yindîyan û harîkarên wan hemi sinur bezandin. Nexasme, kû Zindî di regezda Kurdin, piştî Axa Mihemed Xan Elî di dumahika şerrê xwe da serkeftin li ser dumahik desthilatdarîyê Zindîyan, Letîf Elî Xanî bi destve anî. Biryar da, 20 hezar cotên çavên dijminên wî li bermaberî wî amade bikin. Piştî dengubasê êxsîrkirina Letîf Elî Xanî gêhîştîye Axa Mihemed Xan wî bi xwe bi wê helkeftê biryar da serê şeşsedhezar êxsîrên Zindîyan bên birrîn!




Kerb û kina Axa Mihemed Elî gêhişt pileyeka wisa ewî bi xwe berrkeka bihagiran ewa Kerîm Xanê Zendî (1760-1769) bo hêlayî pirt pirt kir. Çûnkî wê berrkê bîra wî li wan deman tanî, ewên ew li beramber wî radiwestîya. Her di heman demda Axa Mihemed Xan sendirîka Kerîm Xan Zendî di gel Nadir Şahê Efşerî veguhastin û li ber derazînka xwe veşartin, bo hindê, kû mezinîya xwe pê dîyar bike! Ji layekî dive Axa Mihemed Xan Elî xwe di gel wan serkirdên Kurdên di gel wî jî da reftareka nebaş bi kar dianî. Ji wan serkirdên reftareka nebaş hatîye bikaranîn, Sadiq Xan, serokê hoza bi hêz a Şiqaq bu. Ew hoz xwedîyê ji 5 hezar pitir şerrker bu. Her wisa di gel Xusroxan, kî mirê mîrgeha Erdelan bu, ewê desthilatdarî li vê mîrgeha berfireh dikir. Yê dilreq bu. Eve bu egerê hindê, kû Sadiq Xan, Şah Axa Mihemed Xanî li devera Qewqaz di gelê da û li bin xivetî bikuje. Li wê demê, kû ew mijwilî bi ser dagirtina Curcîya (Gurcistan) li sala 1797an.

Li serdema Qaçarî jî proseyên jinavbirina Kurdan berdewam bun. Ehmed Xan Miqedimê desthilatdarê bajarê Miraxê Bapîr Axayê Yekê serokê hozên Mengor tîrorkir. Zêdeberî vê jî ew bi kiryara encamdana çendin proseyên kuştarên bi komel li dijî sedeha kesên hoza Mengor rabu.

Wê demê sîtem û çewsandina Qaçarîyan gêhîştîye gopîtkê, Kur li sala 1880 bi serkirdayetîya Şêx Ubeydullah kurrê Seyid Teha Şemzînanî bi serhildaneka mezin rabun. Hêjaye bêjin, kû Şêx Ubeydullah desthilateka û dinyayî ya mezin di nav Kurdan da hebu. Wî desthildarîya devereka berfireh dikir. Ji deryaça Wanê ji rojavayêve ta deryaçaya Urmîyêve ji layê rojhilatêve ta deverên Mihabad û Erdelan ji layê başûrve. Şêx Ubeydullah bi xwe hindek rûdanên destnîşankirî ji zordarîyên Qaçarî yên Îranî tomarkir û her ev zordarîye bun, buyine palder bo

encamdana serhildanê dijî Tehranê. Ev çende did u nameyên girng de hatîye û ev her du name bo mizgînerê Emrîkî Doktor Kuçeran hatine birêkirin. Hêjîye gotinê ye, kû Doktor kuçeran li Urmê bu û peywendîyeka baş di navbera wî û Şêx Ubeydullah da hebu. Şêx Ubeydullah di nama xwe ya yekemîn da, di rêkefta 25ê îlona 1880, nivîsîye, “Zîrekê desthilatdarîya Qaçarî hukmê sêdaredanê li dijî 50 ji dîvelankên min bicih anî, û bi bihayê sed hezar Tûmenên Îranî zîyan gîhandîye min”. Her wisa Qaçarîyan kesayetîya Kurdî ya berniyas li deverê Ferecellah Xan ta mirinê eşkence da. Qaçarîyan sizayên maddî yên giran li ser serkirdên Kurdan sepandin. Her wisa jin jî êhane dikirin li beramberî vê çendê Şêx ubeydullah ragîhand, kû wî kurrên xwe li pêşîya hêzên xwe bo tolvekirina wan zîyanên gêhîştine birayên wan birêkirine Îranê.

Hêzên Îranê bi palpiştîya Rûs û bi xapandina mizgînerê Emrîkî Kuçeran ewê li bajarê Urmîyê akincî şîyan agirê serhildana Kurdî bivemirînin û jimareka mezin ji serkirdên wê jinavbibin. Di heman demê de Celîl Axa kire devê topê û dema top teqand Celîl  Axa perçivî. Cafer Axa serokê hoza Mengor, ewên roleka mezin div ê serhildana Kurdî da hebu, ji layê serkirdê Îranî Mîr Nîzam, kû di regezda Kurd e, bo kombunê li Seblax (Mihabad) hate gazîkirin. Di wê gazîkirinê dab o wî sûnd xwar, kû çi nexoşîyan nehênîtê heta ew li ser rûyê erdê sax be. Lê piştî Cafer Axa çû, di xîvetêve nobedaran li dûv wê rêkeftina wan û serkirdên Îranî da teqe lê kir û Cefer Axa jîyana xwe ji dest da. Div ê demê da jî Amîr Nîzam jî xuyakir , kû wî xedr li mêvanê xwe nekirîye û soza xwe parastîye. Şunkî wî bi Qûr¨anê sûnd xwari bu, xedrê li Cafer Axa neke, heta ew li ser rûyê erdê be. Her çende li dema Amîr Nîzam ev axaftina digot, li bin erdê bu. Jib o vê meremê korteka taybet bo wî çêkiri bu. Bi vê şêwazê kirên Îranîyan jimareka mezin ji serokhozên hoza Bilbas ya Kurdî li dema gazîkirna wan bo pişkdarîkirinê di ahengeka cejnê da li bajarê Miyanduwab jinavbirin.

Ev dîyarde li gel desthiltdarên Îranî berdewam bu. Serkirdên Kurdan çi wane (ders) box we ji wê kuştin  û jinavbirinê wernegirtin. Desthilatdarê Azerbeycan, ewê li bajarê Tebrîz akincî bu, şîya serkirdê hoyên Şiqaqî yên Kurdî û birayê Simkoyê Şiqaq Cewher Axa bixête tepkekê. Desthilatdarê Azerbeycan daxwaz ji Cewher Axa kiri bu, serdana wî bike û biçe baregaha wî. Bo wî bi Qur¨anê sûnd xwar, kû ew çi nexoşîyan nagihêne wî. Dema kû ew jib o baskirina dozen helawîstî di navbera Îranê û Kurdan û damezirandina wî wek desthilatdar li devera Kurdî li Tebrîz  amade dibe. Bi rastî serkirdê Kurd Cewher Axa ew daxwaz bicih anî. Û di heman dem da jimareka kêm ji nobedarên xwe li gel xwe biribu. Piştî bi dumahîhatina kombunê û dema û dema Cewher Axa xatirê xwe ji desthilatdarê Azerbeycan xwest, pîlanek bo kuştina wî hatibu darêtin. Wek rojhilatnasê Rus Mînorskî dibêje: Leşkerê Îranî teqe li Cewher Axa kir û kuştin. Ew leşkerên di gel wî da bun, bergirîyeka qaramanane jê dikir û gellek nemabu, desthilatdarê Azerbeycanê êxsîr bikin. Lê ji ber pirrbuna wan leşkerên li dora wî bun, şîyan (kanîbun) bi hindek rêkên nêzîkî rêka fîlmên Emrîkî (kawbuyî) xwe qurtal kin. Mînorskî bi çavên serê xwe Cewher Axa di gel heşt nobedarên wî yên bi rextan rapêçayî û di rêzekê da girêdayî bun, dîtine.

## Binemala Pehlewî û milmilana wan di gel Kurdan

.

Di destpêa sala 1921 û piştî wê kudetaya leşkerî (darbeya leşkerî) ya bi piştevanîya Birîtanya hat kirin. Desthilatdarî ket destê Riza Xan. 1925an Riza Xan

binemala Qaçarî la da û  xwe wek şahê Îranê ragîhand. Di heman dem da sîyaseteka dîktatorî beramberî helandina neteweyên cuda cuda peyrew kir.

Serokê Kurd Simko Şiqaq, serokê hozên Şiqaq, ewên li rojavayê derya Urmê dijîn, salên şerrê cîhanê yê yekê û çuna jimareka leşkerên bîyanî bo nav axa Îranê box we wek derfet (firsend) wergirt, bo encamdana serhildaneka Kurdî li 1920-1922 û kanîbu kontrolê li ser pişkeka mezin ji  Kurdistana Îranê bike û serbixweyî ragîhand û bernameyeka Kurdî belavkir. Bi aşkîra daxwazîyên rewa yên gelê Kurd tê da wûyakir. Her wisa Simko Şiqaq li wê geşta wxe ya bo Silêmanîyê li sala 1922an hewl daye, hevkarî di gel desthilatdarê Kurdistana başur (Îraq) Mahmud Hefîd (Şêx Mehmud Berzencî) bike. Ev hewldana wî jî ji bo rêkxistina bizava Kurdî û yekgirtina armancên wan li her du dewletan bu.



Simko xayê Şiqaqî

Ev bizava yek ji diyartirîn astengan bun, ewên ketine rêka Riza Xan. Ewê ji layê xweve hewldida, hêzên Îranê bike yek, û desthilatdarîyeka melbendî ya dîktatorî dambizêre. Lewra şah û desteka desthilatdarîya xwe pîlanek jib o jinavbirina serkirdê Kurd Simko Şiqaq da rê. Bi vî şêweyî yek ji mezinên efserên leşkerên Îranî bi merema danustendinan daxwaz ji Simko kir, kû were bajarê Şino.Ev bajar dikeve başûrê gola Urmîyê, rojhelata sinurê Îraqê. Simko ev xapandina li ber çav negirt. Çi wane (ders) ji kuştina birayê xwe Cewher Axa, ewê bi destê heman desthilatdaran hatibu kuştin, wernegirt. Li 21ê xizîranê Simko berev bajarê Şino çu. Li wir bi şêweyeka kirêt û hovane hat kuştin.

Rûdana tîrorkirina serkirdê Kurd Simko wekî çirûskekê bu. Ji egerê wê serhildan lip ê serhildanê li hemi parçên Kurdistana Îranê peyda bun. Wekî hevkarî di gel serhildana Kurdî ya bi serkirdayetîya Îhsan Nurî Paşa li dijî desthilatdarên Atatûrkên Tirkî hate encamdan. Serhildana hozên Celalî bi serkirdayetîya her du serkirdên Kurd Birho û Ferzende berpa bu. Li dijî vê serhildanê her du hikumetên Tirkî û Îranê hevkarîya hevdu dikirin. I heman demda Birho yek ji serkirdên vê serhildanê bu. Div ê serhildanê gîyanê xwe ji dest da.



Qadî Mihemmed

Mezintirîn rûdan di mêjûya Kurdî da li Îranê ragîhandina yekem komara Kurdî ya di dîroka hevçerxda li Mihabadê hatîye damezirandin. Ji ber vê yekê ji bi Komara Mihabad hatîye binakirin. Lê vê care jî ev li duv bêra Kurdan nehat. Kurdan hizir kir, komara wan bi harîkarî û piştevanîya yekîtîya sovyet dî domdirêj be. Kurdan hizir nekir, kû yekîtîya soviet û wîlayetên yekgirtî berjewendîyên xwe yên taybet, yên heyin, û ev berjewende di gel hêvî û omîdên Kurdan yek nagrin. Li 22ê çirîya paş ya sala 1947an û piştî çend heyvan ji damazirandina vê komarê balyozê

emrîkî li Tehranê daxûyanîyek da û têda ragîhand, kû "Hikumeta Îranê li berehêzên emnahîyê virêke hemi deverên Îranê… ez vê çendê bi biryareka sirûştî û dirust dizanim." Bi vî rengî hêzên Îranê çun nav komara Kurdî û 27ê kanuna yekê 1947an ev komar hilweşand. Serokê wê Qadî Mihemmed û birayê wî Sedr Qadî, endamê parlamana Îranê, û pismamê wî Seif Qadî wezîrê bergirî yê komara Mihabad hatin girtin. Dadgeha leşkerîya Îranê biryara sêdaredana her sê serkirdên Kurd derxist. Dadgehê ev hukmê sitemkar 31ê adara 1947an bicih anî. Hêjaye bêjin, kû Qadî Mihemmed û hevalên xwe dişîyan xwe qurtal bikin. Lê wan ne divîya webikin, belkû wan divîya ew bibine qurbanî. Çûnkî ew berpirsên komarê bun. Bi dirêjahîya serdema şah Mihemed Riza Pehlewî kiryarên jinavbirina serkirdên Kurd berdewam bun. Li salên şêstan bi biryarên Îranî û bi destên Kurdan kesên wek Muînî hatin jinavbirin.

Ji layekê dinve hatina şoreşa îslamî ya Îranî tiştek ji vê dîyardê neguhert. Tersê wê encam da. Kiryarên jinavbirina gelê Kurd û serkirdên Kurd berdewam bun.



Kûştina bi komel ya Kurdan bi destê rejîma îslamî ya Îranê

Bo nimune: Serokê parta dimukratê kurdistana Îranê Ebdulrehman Qasimlo dema bo danustendin li gel Îranê jib o çareserkirina doza Kurdî hatîye gazîkirin. Ew li gel hevalên xwe 13 tirmeha 1989an li Vienna, paytexta Nemsa (Awusturya) li ser destê hewalgîrîya Îranî (îstîxbarata Îranî) Sawma, kî berdewama Sawak bu, hatin tîrorkirin. Bi heman şêweyê Doktor Şerefkendî, sekreterê parta dîmukrata Kurdistana Îranê piştî tîrorkirina Ebdulrehman Qasimlo, 1992an li Berlîn a Almanya hat tîrorkirin.

 

Dr. Ebdulrehman Qasimlo — Dr. Şerefkendî

Li dumahikê dîyar dibe, kû serkirdên Îranî sererayî cudahîyên wan yên hizrî li ser jinavbirin û bidumahîanîna serkirdên Kurdan ewên ta nuke çi wane wernegirtine û her berdewame.